Erêna

# Xwandinek bo rewşa ronakbîrê kurd li deverê 1/2



Sebrî Silêvanî

Têbînî: ev nivîsar e ne derbarê kesek yan layenek taybet e, belê mafê her kes û layenî heye ku bixwîne.

Başûrê Kurdistanê bûyekiyanek azad û heta radeyekê serbixwe. Li gor têgeh û pêkhateyê azadiya li hevhatî, hêj zû ye ku em bibêjin Başûrê Kurdistanê azad û serbixwe ye, belê li gor dorhêl û rewşa devera rojhelatê, bi taybet Tirkya û Îran û piraniya welatên erebî, ez dikarim bibêjim ku heta radeyekê azad û serbixwe ye. Çunkî azadî û serxwebûn li vê deverê hinêrek mezine.

Berê "ango berî serhildanê" çu kiyanên serbixwe bi navê Başûrê Kurdistanê nebûn, belê derbirînên saz û rasteqîne bo hewldana damezrandina wî kiyanî hebûn. Bizava rizgarîxwaza neteweya kurd li her çar parçeyên Kurdistanê, nemaze li Başûr, vê bûçûnê tekûz dike.

Ev kiyan e, buhayek mezin e, armanc û mebestek dêrîn e, neku behane ye bo hindek armancên din. Kiyanê heyî "Başûrê Kurdistanê" bi hemû kêmasiyên xwe ve wek "birakujî, gendelî û

qeyran" ked û berhemê sê aliyên taybet e:

Yek: Xwîna şehîdan.

Du: Siyasetmedarê kurd.

Sê: Hêzên hevpeyman û projeyê rojhelata naverastê yê demokrasî.

Ango; şehîdan xwîna xwe, ruha xwe, ser û samanên xwe hemû bi gorî vî kiyanî kirin, ji bo ku rojekê ji rojan wek niha azad û serbixwe be. Siyasetmedarê kurd jî, bi astê ezmûna xwe, bi hemû kêmasiyên xwe ve, bi alav û şiyanên xwekarî hewl bide û tehemola şikestin, dorandin û derdeseriyên mezin ji bo xatira damezrandina wî kiyanî, bike. Her wesa, hêzên mezin li seranser cîhanê wek "Emerîka, Îngilstan, Yeketiya Ewropa û Sovyêtistana berê" herdem hewl didin li gor berjewendiyên xwe siyaseta xwe "bi taybet ya derveyî" araste bikn, çunkî di siyasetê de, dost û dijminên herdemî nîn in û berjewendiyên wan wesa diselmînin ku Başûrê Kurdistanê deverek stratîjî ye ji bo berdewamiya projeyê Rojhelatê. Her weha, hevpeymanek sereke û cidî ye ji bo ku ew proje pêk bihê.

Belê, pirsyara ku heta niha nehatî azirandin ev e ye:

Erê ka rol û behra ronakbîrê kurd di avakirina vî kiyanê azad û serbixwe de? Mebesta min ne hemû qûnaxên dîrokê ne, belê tenê ji "serhildana buhara 1991-ê" heta roja îro?

## ronakbîrên neteweyan dikarin hevsarê qûnaxê bigirin û li dûv prensîp û armancên neteweyê araste bikin

Ronakbîrê kurd li Kurdistana Başûr, bi taybet li deverê, mixabin bûye paşkoyê siyasetmedarê kurd. Dibe ku ew ne ji hêz û hişmendiya siyasetmedarê kurd be, belê enceq ji lawazî û bê helwîstiya ronakbîrê kurd e. Biborin, kesê ronakbîr, heger rast ronakbîr be, çênabe xwedan kesayetiyek lawaz û bêhelwîst be, belê pêwîst e xwedan peyam û helwîst û însiyatîv be.

Sarter dibêje: "Mirov helwîst e û hew".

Baş e. Heger mirov tenê helwîst be, nexwe ka helwîstên mirovên ronakbîr?

Çima ew ronakbîr, yan dê bibin hewadar, dûvlank û mesînhilgir bo desthelatek taybet, yan jî dê bibin neyarên wê desthelatê û xewnên xirab pê ve bibînin? Çima hewl nadin di bisporiya xwe de

bibin xwedan rol û bandor? Erê hest bi kûratiya trajîdiya vê neteweyê dikin? Erê hest bi metirsiyên li derdorê dikin? Aya pêgiriyê bi erkê xwe yê sincî "exlaqî" li beranber pirs û doza neteweya xwe dikin? Erê di rolê xwe yê dîrokê, di vê qûnaxa hestdar de -wek pîdivî - digehin? Heta kîjan radeyê şiyane derbirînî ji nasname, trajîdî û xewna vê neteweyê bikin?

Bi baweriya min neşiyane bersiva piraniya van pirsyaran bidin û li gel hindê hêj kesekê ji hemûyan jî qelemê xwe neşikandiye.

Dibe, ku hindek ronakbîr hewl bidin berevaniyê ji xwe û lawazî û bê helwîsitiya xwe bikin. Mafê wan heye. Bo nimûne, bibêjin: azadî nîne, bi taybet azadiya derbirînî, belê sansor heye, çewsandin û pêşêlkirina mafê ronakbîran heye, kes pûteyê bi wan nake, kes rolê wan nade û... htd.

Belê mafê min jî heye, ku ez pirsyarekê arasteyî piraniya wan bikim: Sedemên lawazî û bê helwîstiyê, erê behra bêhtir ew bi xwe ne, yan jî zatî ne, ango bi psîkolojiya wan bi xwe ve girêdayî ne?

Dibe ku rewş û destûdarê vî kiyanê "Başûrê Kurdistanê" hêj ne li gor daxwaz û armancên me tevan, yan piraniya me, be. Ji ber ku qûnax qûnaxa guhorînê ye û bêhtir ji alternatîvekê di acendaya hêzên mezin de heye. Belê ronakbîrên neteweyan dikarin hevsarê qûnaxê bigirin û li dûv prensîp û armancên neteweyê araste bikin, dikarin ast û radeyê afirandinê bilind bikin, dişên binemayên hizr û felsefeyek mikum li gor dîroka xwe û her serdemî bo neteweyên xwe dabimezirînin û pêşkêşî nivşên nû bikin, dikarin peyamên xwe bi zimanên saz û rehwan amade bikin, dûrî şûnwarên buhijîn û dagêrkirinê, dikarin li gor bejna wê trajîdiyayê kirasê xwe fersal bikin, dikarin derbirînê ji man û nemana neteweyê bikin, dikarin kadîran ava bikin û rolê herî mezin di qûnaxên azadî, rizgarî û werara neteweyî de bikin.

Ew dikarin wê hemûyê bikin, belê di heyama panzdeh salan de, ronakbîrê me karî çi bike?

Erê, ji bilî dabînkirina rewşa xwe ya kesayetî ji aliyê aborî ve "ew jî bi saya desteserkirina rojname, kovar yan jî dezgehekê ji bo gendeliyê" gelekiya ronakbîrên me karîn çi din pêşkêşî me bikin?